**Qonaxa Veguhêzer a Sûrîyayê**

**Gavekê ber bi pêş ve... du gavan ber bi paş ve**

**Xwendineke Qanûnî-Siyasî der barê Danezana Makeqanûnî ya Sûrîyayê de**

## Yekem: Pêşgotin

Di dîrokê de, rewşa Sûrîyayê ne rewşeke awarte ye. Çimkî, di dîrokê de, gelek caran şoreşên gelêrî ketine qonaxa şerê leşkerî, nêzî rewşa şerê navxweyî yê bi palpiştîya hêzên herênî bûne û pê re pê re komeke leşkerî bi ser ketiye. Di encamê de, me xwe li ber rewatîyeke leşkerî ya li jêr sîwana şoreşê dîtiye. Bi gotineke din, carê ev mesele bi vî rengî pêk tê:

- Carê, şoreş weku tevgereke gel a li dij rêjîmeke heyî dest pê dike.
- Ev tevger hino hino dikeve kirasê şerekî çekdar ê di navbera rêjîmê û hêzên pirreng ên opozîsyonê de.
- Dawîyê, hêzeke leşkerî ya xurt derdikeve holê, rêjîmê têk dibe û dest datîne ser beşeke berfireh a welêt.

Di encamê de, em xwe li ber rewşa biserketineke leşkerî dibînin. Ev hêza biserketî li paş perdeya şoreşê li rewatîyê digere. Bi giranî, ev rewş van encaman derdixe holê:

- **Qelskirina ramana rewatîya gelêrî:** An ku têgiha rewatîyê ya ku xwe dispêre vîna gel tê derbaskirin û têgiha “rewatîya çekan” serdest dibe.
- **Jinûveavakirina zordestîyê:** Zordestîyeke nû -nemaze di qonaxa veguhêzer de- derdikeve holê. Dibe ku ev zordestî di destê artêşê de be û dibe ku di destê komên çekdar ên serdest de be.
- **Xwespartina ser destekdana derveyî:** Pirê caran, ji bo ku serdestîya xwe biparêzin, pêdivîya komên leşkerî yên biserketî bi destekeke navdewletî heye û ji ber vê sedemê, ev kom xwe dixin kirasê peyrewîya siyasî û aborî.

Berbanga 8ê Kanûna Pêşîn a sala 2024an, piştî çendîn salên liberxwedan û sebirkişandina ji ber tawan û bipêkirinên mezin, piştî bi mîlyonên koçberan, bi sedhezarên qurbanîyan û bi dehhezarên windayîyan; rêjîma zordest a Sûrîyayê têk çû û hestên dilşadî û geşbînîyê dilê piranîya xelkê Sûrîyayê tijî kir.

Peyamên pêşketî yên Rêberîya Operasyonên Leşkerî yên di warê rêlibergirtina tolhilanînê, dadmendîyê, parastina rûmeta hemû Sûrîyayîyan, xwedûrxistina ji şêwazên rêjîma têkçûyî û avakirina dewleta qanûn û dadmendîyê bûn pêngaveke rastîn ber bi pêş ve.

Li gor şiroveya borî, Rêberîya Operasyonên Leşkerî dikarî piştî ketina rêjîma berê bi rojekê danezaneke makeqanûnî deyne û pê re desthilatîyan, peywiran û pêşekîyan destnîşan bike. Lê belê Rêberîya Operasyonên Leşkerî, bi serkêşîya rêberê HTŞyê birêz Ehmed El-Şeri, ragihand ku ew ê -di çarçoveya damezrandina desthilatîyeke li ser bingeha prensîpên rewatîya gel de- çend gavên sereke yên damezrîner

biavêje. Gava herî giring lidarxistina Kongreyeke niştimanî ya Sûrîyayî bû ku hemû pêngavên din jê dest pê bikin û bibin bingeha qonaxa veguhêzer. Jixwe di vî warî de, Rêberîya Operasyonên Leşkerî gotibû ku ew ê tenê sê mehan karûbarên dewletê bi rê ve bibe, an ku heta kongreya niştimanî were lidarxistin û qonaxa veguhêzer li ser esasê encamên wê were avakirin.

Lê belê desthilatîyê rêyeke din da ber xelkê: Di 29ê Kanûna Duyem a sala 2025an de, Rêberîya Operasyonên Leşkerî kongreya bi navê Kongreya Biserketinê li dar xist. Rêberîyê 18 komên leşkerî li jêr sîya vê kongreyê kom kirin û di encamê de van komên leşkerî birêz Ehmed El-Şeri kirin serokê qonaxa veguhêzer a Sûrîyayê. Kongreyê peywirên serokkomar da El-Şeri, desthilatîyeke bîsînor kir para wî û rê dayê ku encumeneke qanûndaner a demkî pêk bîne. Kongreyê her wiha Partîya Beisê û partîyên Bereya Niştimanî ya Bipêşverû, dezgehên ewlekarîyê û artêşê û Encumena Gel a Sûrîyayê ji hev xistin û betal kirin, Makeqanûna sala 2012an betal kir, hemû komên leşkerî, dezgehên şoreşgerî, siyasî û sivîl ji hev xistin û ew tev li sazîyên dewletê kirin.

Di demekê de ku ji vê birêveberîya heyî dihat pêşbînîkirin ku li gel hêzên siyasî û civakî û civaka şarwer bişêwire da ku kongreyeke niştimanî ya Sûrîyayî li gor ragihandina xwe ya berê li dar bixe û encamên vê kongreyê bibin bingeha qonaxa veguhêzer; birêveberîyê gavek ber bi paş ve avêt û kongreya niştimanî ya Sûrîyayî veguherand hevdîtineke şêwirkirinê ya bi navê Kongeya Dîyaloga Niştimanî û biryar da ku daxuyanîya dawîyê -ya ku wer dîyar bû ku bi awayekî pêşwext hatibû amadekirin- bibe bingeha pêgavên di pey re û helbet di serî de danezana makeqanûnî. Di 2yê Adara 2025an de, serokatîya Sûrîyayê komîteyeke pisporan bijart da ku reşnivîsa danezana makeqanûnî li gor xalên destnîşankirî yên sereke yên serokkomarîyê deyne. Komîteyê karê xwe bir serî û di 13ê Adarê de reşnivîs radest kir. Serokkomar reşnivîs pesend kir û êdî piştî ku di rojnameya fermî de hat weşandin, bû danezaneke makeqanûnî ya derbasdar.

## Duyem: Xwendinek der barê Nîşan û Wateyên Siyasî yên Danezana Makeqanûnî de

Danezana Makeqanûnî derket û pê re gelek siyasetmedar û qanûnnasan gelek nîşe li ser wê nivîsîn. Her wiha beşên berfireh ên xelkê Sûrîyayê rexneyên xwe li serê gotin. Lê belê hin nîşeyên gewherî yên girêdayî nîşan û wateyên siyasî hebûn, mîna şêwazên danîna danezana makeqanûnî, têgihên ku li serê hatiye avakirin û gelo heta kîjan radeyê dibe bersiva vê rewşa siyasî ya ku Sûrîya tê re derbas dibe. Nîşeyên sereke girêdayî tunebûna civaka siyasî, felsefeya siyasî û rastîya siyasî bûn.

**1. Pêşî, makeqanûn arêşeyeke siyasî ye:** Danîna danezana makeqanûnî yan danîna makeqanûnê bi xwe ne arêşeyeke qanûnî bi tenê ye, lê belê ew berî her tiştî arêşeyeke siyasî ye. Pêşekîya danîna makeqanûnê ya civaka siyasî ya Sûrîyayê ye (an ku hêz û tevgerên siyasî), wate divê pêşî lihevkirineke siyasî ya Sûrîyayî li ser çend arêşeyên sereke yên girêdayî dewlet, desthilatî, gel û welatîbûnê çêbibe (ku jixwe ev hemû meseleyên siyasî ne). Paşê, divê ev lihevkirin biçin ber destên komîteyeke makeqanûnî ya yasayî da ku wê lihevkirina siyasî bixe qalibê madeyên qanûnî. Gava ku danezana makeqanûnî (yan makeqanûn) biçe ber destên mafnasan bi tenê, rê tê windakirin, çimkî makeqanûn berî her tiştî xebateke siyasî ya payebilind e.

**2. Tunebûna felsefeya siyasî:** Danezana makeqanûnî hevgirtineke metodolojîk an felsefeyeke siyasî ya dîyar û hevgirtî li xwe nagire. Danezana makeqanûnî çend têgihên ku gewdeyekî hevgirtî pêk

nayînin li hev kom kirin, mînak: Ji hêlekê ve behsa Danezana Navdewletî ya Mafên Mirovan kiriye lê bi tu rengî behsa pergala demokratîk nekiriye, nemaze ku peyvên demokrasî û pergala demokratîk bi eşkeretî di Danezana Navdewletî ya Mafên Mirovan re derbas dibin. Ev tê wê wateyê ku ev danezana makeqanûnî bêyî felsefeyeke siyasî ya zelal hatiye nivîsîn û di encamê de tijî nakokî ye. Çi makeqanûn (an danezaneke makeqanûnî) nêrînekê di jîyanê û avakirina dewlet û siyasetê de dinimîne, lê belê ev danezan -ji hêlekê ve- çend têgihên dijhev bi rengekî bijêrî kom kirine û ji hêleke din ve bi awayekî ev têgih xistine ber xizmeta navendîbûna desthilatîyê û jinûveavakirina zordestîyê.

Weku mînak, têgihên ku hatine bikaranîn ne zelal in an jî hatine tevlihevkirin, mîna têkilkirina têgihên dewlet, desthilatî, hikûmet û pergala siyasî. Çimkî ev têgih ji hev cuda ne û zelalkirina cudahî, navber û têkilkirinên di navbera wan de ji bo avakirina pergaleke demokratîk a sazûmanî pir giring e. Ev tevlihevkirin û têkilkirina heyî, çi bi mebest be çi bê mebest be, zordarîyê ji nû ve hildiberîne û ava dike, nemaze ku hemû di vê danezana makeqanûnî de bi peyva desthilatîya cîbicîker hatine nimandin. Wekî din, destnîşankirineke baldar a hin têgihan û têkilîya di navbera wan de nehatiye dîyarkirin, çimkî makeqanûn li ser zelalîya sê bingehên dewleta Sûrîyayê tê avakirin.

**3. Tunebûna rastîya siyasî:** Rastîya rewşa siyasî ya Sûrîyayê di danezana makeqanûnî de nayê dîtin. Ev danezan piştî şoreş, şer, parçebûn, nehezî, aborîyeke hilweşîyayî û desttêwerdanên derveyî yên pir mezin hatiye danîn. Ji ber vê sedemê, gerek ev hemû xalên borî li ber çavan bigirtina û xwe dûrî jinûveavakirina navendîtîyê û hizira rûniştandina zorbirinê bixsita. Gerek bû vê danezanê xelkê Sûrîyayê li dor xwe kom bikira (xalên hevbeş li xwe bigirta). Kesên ku hizir dikin ku dikarin Sûrîyayê bêyî pergaleke "nenavendî" bi rê ve bibin pir şaş in û her wiha ew hizira dibêje ku zorbirina alîyên din dikare Sûrîyayê bigihîne aramî û silametîyê pir şaş e.

## Sêyem: Xwendinek der barê Bendên Danezan Makeqanûnî de

Danezana makeqanûnî berfireh e û weku makeqanûneke demkî ye. Danezan ji pêşgotinekê û 53 madeyan pêk tê. Bi giştî, danezana makeqanûnî gaveke ber bi paş ve ye. Em, di Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê de, dibînin ku danezana makeqanûnî tu deqên ku hevparîya civakî ya berfireh di birêvebirina qonaxa veguhêzer de rûdinîne di nava xwe de nahewîne. Danezan rê nade beşdarkirina nûnerên civaka şarwer û komên ciwan û jinan û rê nade beşdarkirina xelkê di şêwirên giştî de jî. Ev dûrxistin rûyê navendî yê desthilatîyê nîşan dide, civakê dûrî prosesa biryarwergirtinê dike û bingehên demokratîk ên qonaxa hatî qels dike. Ev danezan her wiha li dij prensîpên rewatîya gelêrî ye ya ku rêberîya qonxana veguhêzer di gotarên xwe yên pêşîn de teqez dikir ku ew ê her tiştî li serê ava bikin.

### 1. Beşa Yekem: Rêgezên Giştî

Yeksanîya temam û bêkêmasî di navbera hemû Sûrîyayîyan de.

Welatîbûn xwe dispêre du bingehên sereke. Bingeha yekem wekhevî ye. "Welatîbûn hin caran weku rewşa wekhevîya di navbera erk û mafan de tê nasîn.» Bingeha duyem beşdarîya aktîv a di warên si-

yasî, aborî, civakî û çandî de ye. Wekhevî ew e ku hemû kes rastî heman danûstandinê bên. Wate gerek hemû welatî heman erk û mafan li gor qanûnê bibînin û tu cudakarî di navbera wan de tunenebe. Li gel ku madeya dehem a danezana makeqanûnî behsa prensîpa wekhevîyê kiriye, lê belê çend madeyên din ên li dij benda wekhevîyê li xwe girtine.

Madeya sêyem a makeqanûna 2012an di vê danezanê de hatiye dubarekirin, an ku madeya girêdayî ola serokkomar. Bi vî rengî, peyrewên olên din ji postên giştî yên dewletê hatine dûrxistin. Danezanê her wiha dîyar kiriye ku “fiqha îslamî” çavkanîya sereke ya qanûndanînê ye ku di makeqanûnên berê de çavkanîyeke sereke ya qanûndanînê bû; an ku yek ji çavkanîyên sereke bû û ne çavkanîya sereke ya tenha bû.

Baş dîyar nîne ka çima peyva “çavkanîya sereke” bi “El/ال”a binavkirinê ya zimanê Erebî hatiye bikaranîn û nebûye yek ji çavkanîyên sereke weku makeqanûnên berê! Li gor hin kesan, peyva “çavkanîya sereke” xwedan wateyeke pir giring e, çimkî wiha eşkere dike ku fiqha îslamî çavkanîya serdest û serkêş a danîna qanûnan e û heger nivîseke şirovekar a fiqha îslamî di mijarekê de hebe, dê ev nivîs were derbaskirin û nabe ku em berê xwe bidin rêgezên qanûnî yên ku mirovan danîye. Berê ne wiha bû, çimkî fiqha îslamî yek ji çavkanîyên sereke yên danîna qanûnan bû û pê re rê li pêş avakirina qanûnan li ser bingeha qanûn û rêgezên mirovî nedihat girtin.

Wekî din, vê danezanê ol wekî olên esmanî bi nav kirine, an ku peyrewên olên wekî Êzidî û Murşidî û olên din hatine marjînalkirin û dûrxistin û êdî dewlet mafên peyrewên van olan, di serî de mafê wan ê baweranînê, naparêze.

Li hêleke din, nasnameya çandî ya neteweyeke Sûrîyayê hatiye serdestkirin. Danezanê zimanê Erebî weku tenha zimanê fermî yê dewletê nîşan daye û bi tu rengî bal nekişandiye ser zimanên din ên mîna zimanên Kurdî û Suryanî. Danezanê her wiha Erebîtî kiriye nasnavê dewletê. Danezanê bîr nebiriye ku Erebîtî nikare bibe prensîpa welatîbûnê û nikare welatîyên ji kêmneteweyên ne Ereb tev li dewletê bike, çimkî hemû Sûrîyayî ne Ereb in.

Di vî warî de, danezanê civakên resen (kêmnetewe) ên Sûrîyayê xisitine nav çarçoveya têrma “pirrengîya çandî” û gotiye ew ê “mafên wan ên çandî û zimanî” biparêze. Ev çarçoveya giştî û bêpîvan ne zelal e û hebûna van neteweyan bi rengekî qanûnî nas nake, çimkî ev komên neteweyî yên heyî û rastîn in û ne komên çandî yên pirreng in. Wate mafê wan heye ku makeqanûn cihêrengîya wan a neteweyî bi eşkeretî nas bike.

**2. Beşa Duyem: Maf û Azadî**

- Danezana makeqanûnî hemû maf û azadîyên ku di peyman, belge û lihevkirinên navdewletî yên di warê mafên mirovan de yên ku Komara Erebî ya Sûrîyayê îmze kirine weku beşeke danezanê dane peyitandin. Berawirdî makeqanûnên berê, ev gav gaveke pêşketî û ber bi rêya rast ve ye, çimkî êdî ev danezan li ser cîhangerîya mafên mirovan vekirî ye. Wekî din, madeya 18em a danezana makeqanûnî dîyar kiriye ku tawanên êşkencekirinê bi borîna demê re nakevin. Lê belê ev gava han teorîk û giştî ye hemin neketiye çarçoveyên pratîk û tu amyarên qanûnî yên pêkanîna wê nehatine destnîşankirin, nemaze destnîşankirina pêkanînên pratîk gava nakokîyek di navbera rêgezên lihevkirin û peymanên

navdewletî û bendên danezana makeqanûnî de derkeve holê. Wekî din, bendeke sereke di vê danezanê de nîne: Bendek nîne bibêje ku gerek qanûnên niştimanî li gel rêgezên wan lihevkirin û peymanên navdewletî biguncin.

Danezana makeqanûnî tenê maf û azadîyên di peymanên navdewletî yên di warê mafên mirovan de destnîşan dike û weku beşeke makeqanûnê dîyar dike, lê di rastîyê de, ji bilî komîteya kesên nivîşkan û kêmendam, Sûrîyayê destdan û serwerîya tu komîteyeke van peymanan nas nekiriye. Wate, danezan bi vê derbirîna xwe, komîteyên van peymanan, mîna komîteya dij êşkencekirinê, nas nake.

- Beşa danezanê ya girêdayî maf û azadîyan, hemû mafên şarwer, siyasî, civakî, aborî û çandî yên ku di makeqanûna 2012an de derbas dibûn, dubare derbas kirine. Ev beş van mafan li xwe digire: Mafê azadîyê, saxîtî û silametîya laş, tûşînekirina êşkenceyê, mafê çûn û hatinê, azadîya nêrîn û derbirînê, mafê beşdarîya siyasî, mafê darizandin û parastinê, mafê hînkirinê û mafê kar. Di vî warî de, divê desthilatî pêkanînên destnîşankirî yên cîbicîkirina van mafan bibe serî.

- Belam madeya 23yem a danezana makeqanûnî nakokîyekê li xwe digire; ev nakokî dikeve navbera "parastina maf û azadîyan" û "sînordarkirina wan bi rêya bergirîyên pêwîst ên girêdayî ewleyîya niştimanî yan silametîya erdan an silametîya giştî yan parastina pergala giştî û rêgirtina li ber tawanan an jî parastina tendirustîyê yan sincên giştî". Ev danasîn wiha fireh hatine û dikarin bi gelek şêweyan werin şirovekirin û êdî li dij prensîpa herî giring a danezana makeqanûnî derkevin. Her wiha li dij qanûna navdewletî ya mafên mirovan in jî, çimkî piranîya mafên ku hatine sînordarkirin, di peymanên navdewletî de wiha tên parastin:

"Ji bilî ew qeyd û bendên ku li gor qanûnê tên danîn û di civakeke demokratîk de bergirîyên pêwîst pêk tînin; nabe tu qeyd û bend li ser vî mafê bên danîn..."

- Benda 2yem a madeya 14em a danezana makeqanûnî dibêje ku "dewlet karê komele û sendîkayan misoger dike". Ev deq behsa misogerîya serbixweyîya komele û sendîkayan nake. Heger em li reftarên piştî ketina Rêjîma Beisê binêrin, em ê bibînin ku birêveberîya nû hemû sendîka ji hev xistin û encumenên nû yên sendîkayan erkdar kirin. Nexwe gava danezan balê nakişîne ser pabendîya dewletê bi serbixweyîya sendîkayan, ev tê wê wateyê ku birêveberîya heyî dikare encumenên ku wê bi xwe ew erkdar kirine pênc salên li pêş me wekî xwe bihêle.

Wekî din, benda yekem a vê madeyê dibêje ku dewlet mafê beşdarîya siyasî û avakirina partîyan li ser bingehên niştimanî û li gor qanûneke nû diparêze, lê belê tu dem bo danîna vê qanûnê destnîşan nake. Di warê pratîk de, îroroj, tu kes nikare karekî partîtîyê li Sûrîyayê bike.

Dîsa di warê maf û azadîyan de, danezana makeqanûnî tu garantîyan ji bo parastina maf û azadîyan ji guhertin û serrastkirinan nade. Wate nabêje ku maf û azadî beşeke prensîpên sereke yên pergala makeqanûnî ya dewletê ne û nabe ku ji hêla makeqanûnî ve di ber çavan re werin derbaskirin û guhertin. Mînak, qanûna bingehîn a Almanyayê rê li ber her lêvegereke makeqanûnî ya li dij prensîpên rûmeta mirovan û cîbicîkirina rasterast a mafan digire.

### 3. Beşa Sêyem: Pergalên Hikimdarîyê di Qonaxa Veguhêzer de

**A. Nebûna Hevsengîyê di Navbera Her Sê Desthilatîyan de**

Danezana makeqanûnî pergaleke serokatîyê dadimezrîne. Ev pergal hêzeke berfireh dide desthilatîya cîbicîker a li jêr serdestîya serokkomar û her sê desthilatîyan bi temamî ji hev cuda dike ku jixwe ev di pergalên serokatîyê de naskirî ye. Lê belê carê ji bo ku desthilatîya cîbicîker dest nedeyne ser hemû hêzên dewletê û ser desthilatîyên din ên pergala serokatîyê, her sê desthilatî (ya cîbicîker, ya qanûndaner û ya dadgerî) bi hevsengî tên belavkirin da ku desthilatîya giştî nekeve destê yekê ji wan bi tenê. Jixwe cudakirina tam a di navbera van her sê desthilatîyan de nayê wateya ku hevkarîgerî di navbera wan de nebe. Berevajî vê hizirê, divê sazgêrîyên çavdêrî û hevsengîyê (Checks and balances) hebin da desthilatîyek bi ser yên din zal nebe û zordestî rûnene. Hin sazgêrîyên herî giring ên çavdêrî û hevsengîyê ev in:

- **Erêkirina peywirdarkirinan:** Pirê caran peywirdarkirina di postên payeberz de (wekî wezîr, dadger, serokên desteyên serbixwe, dozgerê giştî) girêdayî erêkirina encumena gel e. Ev yek li ser astên cihêreng ên peywirên di pergalên serokatîyê de û heta di pergalên nîv-serokatîyê, pergalên parlamenterîyê yan pergalên qiralîya makeqanûnî de jî derbasdar e.

- **Pêngavên jikarxistinê:** Desthilatîya qanûndaner dikare hesab ji berpirsên cîbicîker bixwaze yan jî wan ji kar bixe. Mînak, ev pêngav wezîr û berpirsên hikûmetî yên gendel û bedkar li xwe digire.

Mixabin, sazgêrîyên çavdêrî û hevsengîyê bi tu rengî di vê danezana makeqanûnî de derbas nabin. Desthilatîya serokkomar di warê peywirdarkirinan de bêsînor e û ji bilî pirskirina ji wezîran, encumena gel nikare tu tiştî bike.

- **Çavdêrîkirina fermanên cîbicîker:** Dadgehên pergala serokatîyê, nemaze dadgeha makeqanûnî ya bilind, dikarin li fermanên cîbicîker ên serokkomar vegerin û binêrin bê ka li gel makeqanûnê diguncin an na. Heger dadgehê got ku fermana cîbicîker ne li gor makeqanûnê ye, dikare betal bike. Lê belê heger em berê xwe bidin Dadgeha Makeqanûnî ya Bilind a Sûrîyayê, em ê bibînin ku dadgeha makeqanûnî dikare tenê li qanûnên ku encumena gel datîne binêre û vegere lê tu desthilatîya wê li ser fermanên cîbicîker ên serokkomar tuneye. Ji ber vê yekê, gerek ev kêmasî di qanûna nû ya birêxistina Dadgeha Makeqanûnî ya Bilind a Sûrîyayê de were bêalîkirin û desthilatîya dadgehê li ser fermanên cîbicîker ên serokkomar jî hebe.

Li gor qanûna kargerî (îdarî), mirov dikare berê xwe bide dadgerîya kargerî û li ber hin biryarên serokkomar rabe û li dij derkeve, lê belê divê ev biryar di çarçoveya kargerîyê de bin (mîna peywirdarkirin an jikaravêtina karmendekî hikûmetî, an destûrdan... hwd). Nexwe di hin rewşên ku qanûna wan destnîşan dike de, mirov dikare berê xwe bide dadgerîya kargerî û li dij hin biryaran derkeve, lê divê were zanîn ku heger dadgeh tiştekî din nebêje, lidijderketin cîbicîkirina fermana serokkomar ranawestîne.

**B. Desthilatîya Dadgerî Ne Serbixwe ye**

Di pergala serokatîyê de, serbixweyîya dadgerîyê tiştekî pir giring e, ji ber ku ev serbixweyî dibe misogerîya parastina mafan û azadîyên giştî di dewletê de. Di pergala serokatîyê de ku serok serê dewlet û hikûmetê ye, gava desthilatî dikevin nav destên kesekî tenê, gelek metirsî derdikevin holê û ev yek serbixweyîya dadgerîyê di meseleya misogerkirina maf û azadîyan de dike xaleke pir giring û jêneger.

- **Encumena Bilind a Dadgerîyê:** Li gor madeya 51ê ya danezana makeqanûnî, qanûna desthilatîya

dadgerî ya ku niha derbasdar e dê dewam bike, an ku fermana qanûndanerî ya 98em a sala 1961ê û guhertin û serrastkirinên wê. Ev ferman desthilatîya cîbicîker li ser karê dadgerîyê dike serdestekî bêsînor û rê dide wezareta dadê ku pêşniyazên peywirdarkirina dadgerên biryarwergirtinê û yên dozgerîya giştî pêşkêş bike û her wiha wan payeberz bike, veguhêze, cezayan li wan bibire, wan ji kar biavêje, destjikarberdana wan bipejirîne û wan bike xannişîn an wan bi demkî ji kar dûr bixe. Zêdebarî vê yekê, ev ferman dadgerên kargerîya pişkinînê bi wezîrê dadê û serokê encumena bilind a dadgerîyê ve girêdide. Jixwe biryarên girêdayî peywirdarkirina dadgeran, payeberzkirina wan, veguhastina wan, cezakirina wan, jikarxistina wan, xannişînkirina wan, dûrxistina wan a demkî ji kar û pejirandina destberdana wan a ji kar bi rêya fermaneke îmzekirî ya wezîrê dadê derdikevin. Fermana behskirî maf dide desthilatîya cîbicîker ku dadger li pêşber encumenê bide darzandina pîşeyî. Ev yek bi rêya fermanekê, li gor pêşniyaza wezîrê dadê yan serokê encumena bilind a dadgerîyê, pêk tê.

Em vegerin qanûna desthilatîya dadgerî ya ku di 15.11.1961ê de bi fermana qanûndanerî ya 98em derketiye, li gor vê qanûnê, bi taybetî li gor madeya 65em a ku bi fermana qanûndanerî ya 24em a sala 1966an "hatiye serrastkirin", encumena bilind a dadgerîyê bi vî rengî tê sazkirin:

* Serokê komarê, wezîrê dadê cîyê wî digire û dibe serokê encumenê.

* Serokê dadgeha pêdeçûnê dibe endamekî encumenê.

* Du cîgirên herî kevin ên dadgeha pêdeçûnê, dibin du endamên encumenê.

* Cîgirê wezîrê dadê dibe endamekî encumenê.

* Dozgerê giştî dibe endamekî encumenê.

* Serokê birêvebirîya pişkinîna dadgerî dibe endamekî encumenê.

Li vir, divê were gotin ku wezîrê dadê yê hikûmeta birêvebirina karûbarên Sûrîyayê, piranîya endamên encumena bilind a dadgerîyê li dij qanûna desthilatîya dadgerî peywirdar kirine û piranîya wan ji derveyî sazîya dadgerî hatine peywirdarkirin.

- **Dadgeha Makeqanûnî ya Bilind:** Serbixweyîya dadgeha makeqanûnî ya bilind, nemaze di pergala serokatîyê de, meseleyeke pir giring e, nemaze gava em bala xwe bidin rola wê ya giring di warê parastina maf û azadîyan, cudakirina desthilatîyan û parastina makeqanûnê li hember desthilatîya berfireh a serokê dewletê de. Belam madeya 47em a danezana makeqanûnî mafekî bêsînor ê destnîşankirin û peywirdarkirina her heft endamên dadgeha makeqanûnî ya bilind daye serokê komarê.

### C. Desthilatîyeke Qanûndaner a Qels û Neserbixwe

Piştî xistina rêjîmekê di encama derbeyeke leşkerî yan şoreşeke gel de, peywirdarkirin û destnîşankirina encumeneke gel an parlamentoyekê ne meseleyeke awarte ye. Ev yek li gelek welatên li herêma me û derveyî wê qewimîye. Lê helbet ev kar serbixweyîya desthilatîya qanûndaner ji holê radike. Çi bi rengekî rasterast çi bi rengekî nerasterast, danezana makeqanûnî desthilatîya peywirdarkirina endamên encumena gel bi vî rengî daye:

* Bi rengekî rasterast: Serokkomar sêyeka endamên encumena gel destnîşan dike.

* Bi rengekî nerasterast: Serokkomar endamên komîteyekê destnîşan dike û ew komîte du sêyekên din ên endamên encumena gel destnîşan dike.

Di pergala serokatîyê de, desthilatîya qanûndaner hevsengîya di navbera desthilatîya cîbicîker û desthilatîya dadgerî de diparêze. Bi vî rengî, desthilatîya cîbicîker qanûnê binpê nake, çimkî pêkanînên parlamentoyê û çavdêrîya berdewam serok û wezîran dixe jêr nirxandina domdar.

Lê xala balkêş a vê danezana makeqanûnî ew e ku -berawirdî encumenên gel ên pergalên serokatîyê, desthilatîya qanûndaner li jêr behaneya cudakirina desthilatîyan di vê danezanê de hatiye qelskirin û desthilatîya wê hatiye sînordarkirin. Ev yek bi vî rengî çûye serî:

- **Tunebûna çavdêrîkirinê di peywirdarkirinên mezin de:** Di pergalên serokatîyê de, serokkomar peywirdarên postên mezin destnîşan dike, lê belê di piranîya van pergalan de gerek encumena gel van peywirdarkirin/destnîşankirinan pesend bike. Di danezana makeqanûnî ya Sûrîyayê de, encumena gel ne xwedan vê desthilatê ye.

- **Tunebûna hêza avakirina komîteyên lêpirsînê yan bawerîkişandinê yan pêngavên jikarxistinê:** Li gor danezana makeqanûnî, encumena gel nikare çavdêrîya karûbarên desthilatîya cîbicîker bike. Tenê dikare pirsan ji wezîran bike. Encumen nikare komîteyên lêpirsînê pêk bîne, nikare bawerîyê ji wezîrekî bikişîne û tew nikare gavên jikarxistina serokê komarê biavêje.

- **Kêmasîya di çavdêrîya darayî ya malê giştî de:** Di pergalên serokatîyê de, parlamento xwedan desthilatîya tam a erêkirina budceya niştimanî ye. Ev tê wê wateyê ku hikûmet nikare bêyî erêkirina parlamentoyê pereyan xerc bike yan çavkanîyan terxan bike. Bi xêra vê çavdêrîya darayî, desthilatîya cîbicîker di çarçoveya sînorê ku parlamentoyê xêz kiriye de kar dike. Ev çavdêrîya parlamentoyê dibe du beş; budceya giştî û hesabên dawîyê.

Hesabên dawîyê raporeke darayî ye; çawanîya cîbicîkirina budceya ku hatiye erêkirin eşkere dike. Ev rapor balê dikişîne ser kîtekîtên dahatî û xerckirinên rastîn ên ku li gor nirxandinên di budceyê de hatine cîbicîkirin.

Her çendî danezana makeqanûnî desthilatîyên encumena gel ên pesendkirina budceya giştî weku xwe hiştine; desthilatîya çavdêrîkirina hesabên dawîyê jê standiye. Danezanê her wiha li desthilatîya cîbicîker ferz nekiriye ku hesabên dawîyê raberî encumena gel bike da ku erê bike; wê ev benda ku di makeqanûna 2012an de hebû rakir. Di makeqanûna 2012an a serdema Rêjîma Beisê ya ketî de, benda çarem a madeya 75em behsa «erêkirina budceya giştî û hesabên dawîyê» dikir.

### Ç. Desthilatîyên Berfireh ên Serokê Komarê

Em dizanin ku berawirdî pergala parlamenterî, pergala serokatîyê desthilatîyên berfireh dide serokê dewletê, lê danezana makeqanûnî desthilatîyên serokkomar ji desthilatîyên wî yên di makeqanûna 2012an de jî berfirehtir kiriye.

- Li gor madeya 50yem a danezana makeqanûnî, tenê serokê komarê dikare danezana makeqanûnî serrast bike û encumena gel nikare pêşniyaza serrastkirina danezanê jî bike.

- Li gor madeya 33yem, yek ji berpirsyarîyên serokomar “rûniştandina nirxên bala û sincên pak e”. He-

min desthilatîyên serokkomar pir berfireh in, em baş nizanin ka gelo mebesta vê hevokê çi ye û bi çi rengî dikare were pêkanîn.

- Li gor benda yekem a madeya 41em a danezanê, serokkomar dikare şer û seferberîyê ragihîne. Ev yek bi erêkirina encumena ewleyîya neteweyî pêk tê ku jixwe serokkomar -bêyî erêkirina parlamentoyê- wan destnîşan û peywirdar dike. Carê, heger rewşeke awarte nebe yan welat li hember şerekî li ber xwe nede, serokkomarê ku rêberê giştî yê artêşê û hêzên çekdar e, nikare biryara şerkirinê yan şandina hêzên leşkerî bo derveyî welêt wergire (mînak: Makeqanûna Tirkîyayê û ya DYAyê).

- Ragihandina rewşa awarte li gor benda duyem a madeya 41em a danezanê. Serokkomar dikare, piştî erêkirina encumena ewleyîya neteweyî û şêwirkirina bi serokê encumena gel û serokê dadgeha makeqanûnî, rewşa awarte bi rengekî giştî yan sînordar bo sê mehan li dewletê ragihîne. Lê belê ev rewş bêyî erêkirina encumena gel careke din nayê dirêjkirin.

- Serrastkirin û guhertina naveroka peymanên ku encumena gel wan pesend dike: Li gor madeya 37em a danezanê, serokkomar "îmzeya dawîn" li jêr peymanên li gel dewlet û rêxistinên navdewletî dideyne.

Carê, serokkomar îmzeya pêşîn dideyne û paşê peyman diçe pêş parlamentoyê da ku pesend bike. Piştî pesendkirinê, peyman dibe peymaneke derbasdar. Lê vê danezanê îmzeya serokkomar kir îmzeya dawîn û pê re nezelalî û nedîyarîyek derxist holê, çimkî heger encumena gel peymana navdewletî li gor desthilatîyên xwe yên di benda (C)yê ya madeya 30yem de pesend bike jî, ev pesendkirin berhemê nade û bêyî erêkirina serokkomar tu wateya wê nîne. Wate, heger serokkomar peymanê îmze neke, encumena gel nikare tu tiştî bike.

- Li gel ku danezana makeqanûnî rê nade serokkomar ku qanûnan deyne, madeya 37em a danezanê rê dide serokkomar ku rêziknameyên cîbicîker û sazker, rêziknameyên kontrolkirinê û fermanên serokatîyê li gor qanûnan derîne. Li gor sînorê ku vê danezana makeqanûnî xistiye navbera her sê desthilatîyan, desthilatîyên qanûndaner û dadgerî nikarin tu tiştî li hember "ferman û biryarên serokatîyê" bikin û ev ferman û biryar vekirî ne. Mînak, biryara sazkirina encumena ewleyîya neteweyî û endamtî û desthilatîyên wê bi biryara serokatîyê ya 5em hatiye derandin. Heman tişt ji bo "rêziknameyên kontrolkirinê" derbasdar e ku şirovekarên qanûnî wan weku "alaveke desthilatîya cîbicîker a ji bo parastina pergala giştî, sincên giştî û tendirustîya giştî" bi nav dike.

#### 4. Beşa Çarem: Rêgezên Kutahîyê

Derbaskirina dadmendîya veguhêzer di madeya 49em a danezana makeqanûnî de li gel pêşekîyên qonaxê yên cîbicîkirina lihevkirina niştimanî û jinûveavakirina bawerîyê di navbera pêkhatîyên civaka Sûrîyayê de digunce. Em dizanin ku darizandina berpirsên binpêkirinên mafên mirovan binyata dadmendîya veguhêzer e. Li gel ku Rêjîma El-Esed berpirsa piranîya tawanên ku li Sûrîyayê rû dane ye, lê gerek agirê dadmendîyê bigihe hemû alîyên şer ên ku tawan kirine. Danezanê Rêjîma El-Esed bi tenê weku berpirsa tawanên li dij xelkê Sûrîyayê nîşan daye û tawanên rêxistina DAIŞê ya terorîst û alîyên din ên ku di şerê li Sûrîyayê de tawan kirine paşguh kirine. Ev yek dê dadmendîya veguhêzer bixe kirasê dadmendîya vebijêr.

Danezanê tawanên şer, tawanên li dij mirovahîyê û tawana komkujîyê ji prensîpa "bipaşvekarnekirina

qanûnan" derandiye û ev yek li gel qanûn û dadgerîya navdewletî digunce. Lê kêşe ew e ku ev tawan bi Rêjîma El-Esed bi tenê ve hatine girêdan û negihane alîyên din ên şer ên ku hemûyan -heta radeyekê-kirinên weku tawanên şer û tawanên li dij mirovahîyê pêk anîne. Hin alîyên din kirinên weku komkujîyê pêk anîne, mîna tawanên DAIŞê yên li dij Êzidîyan li Sûrîyayê.

Heman tişt ji bo paşguhkirina alîyên şer derbasdar e. Di nava 14 salên borî de, gelek alîyên şer binpêkirinên mezin li dij xelkê Sûrîyayê pêk anîn, îcar nabe tenê pesindana Rêjîma El-Esed û sembolên wê weku tawan bê dîtin. Nabe tenê mandelkirina tawanên Rêjîma El-Esed û sivikkirina wan bibe tawan û binpêkirinên alîyên din ên şer bên derbaskirin û neyên dîtin.

- **Der heqê dema qonaxa veguhêzer de:** Danezana makeqanûnî pênc sal bo qonaxa veguhêzer destnîşan kirine. Ji dema pesendkirina danezanê û heta danîna makeqanûneke mayînde û lidarxistina hilbijartinan li gor wê makeqanûnê. An ku bidawîbûna qonaxa veguhêzer girêdayî danîna makeqanûna dawîn e, lê belê tu dem bo danîna makeqanûnê yan sazgêrîyên danîna wê nehatiye destnîşankirin. Jixwe nehatiye dîyarkirin ka gelo heger danîna makeqanûnê dereng ma dê çarenivîsa welat çi be! Danezanê tu misogerîyên ji bo qedexekirina dirêjkirina qonaxa veguhêzer nedanîne. Li gor madeya 50yem a danezana makeqanûnî, dibe ku danezana makeqanûnî bi pêşniyaza serokkomar û erêkirina du sêyekên encumena gel were serrastkirin.

## Çarem: Tiştê ku Danezanê Negotiye

- **Serwerî ya gel e:** Danezanê negotiye "gel çavkanîya desthilatîyan e". Ev prensîp di hemû makeqanûnên borî de hebû, çimkî gel bi rêya hilbijartinan desthilatîyê dide desthilatîyên cîbicîker û qanûndaner. Her wiha gel desthilatîya damezrîner a makeqanûnê pêk tîne û ew bi xwe çavkanîya rewatîya wê ye. Ev yek bi eşkeretî di madeya 21em a Danezana Cîhanî ya Mafên Mirovan de derbas bûye. Di warê pratîk de, serwerîya gelêrî girêdayî encamên qonaxa veguhêzer û danîna makeqanûna dawîn e: Dibe ku ew makeqanûn desthilatîya damezrîner vegerîne destên gel da ku ev gel wê bi rengekî demokratîk bi rêya nûnerên xwe bimeşîne û dibe ku di destên desthilatîya heyî ya hikimdar de bihêle.

- **Parastina pêwendîyan (komunîkasyon):** Danezanê behsa parastina pêwendîyan nekiriye ku ev yek beşeke parastina mafê jîyana taybet e. Guh dide misogerkirina nehênîya danûstandin, peyaman û pêwendîyên kesane (wekî pêwendîyên telefonî, peyamên postê û pêwendîyên elektronîk). Her wiha qedexekirina diznêrîyê/xefnêrîyê yan derketina li dij pêwendîyan bêyî ku behaneyeke qanûnî hebe. Benda duyem a madeya 42yem a makeqanûna 2012an digot: "Nehênîya pêwendîyên telefonî û pêwendîyên peyamnêrî û elektronîk parastî ye û nabe ku bêyî biryareke dadgerî bên eşkerekirin".

- **Mafê bidestxistina zanyarîyan:** Li gel ku mafê bidestxistina zanyarîyan bingeheke sereke ya zelalî, berpirsyarîtî û beşdarîya welatîyan di karûbarên giştî de ye; danezana makeqanûnî bi tu rengî behsa vî mafî nekiriye. Behsnekirina vî mafî nêrîneke klasîk û girtî ya rola dewletê li hember welatîyên wê dinimîne, çimkî tunebûna misogerîyên xwegihandina zanyarîyên giştî, prensîpên azadîya derbirîn û ragihandinê bêwate dike û ji hêla pratîk ve vala derdixe.

- **Mafê kombûna aştîyane, xwenîşandan û grevan:** Danezana makeqanûnî bi tu rengî behsa kombûna aştîyane, xwenîşandan û grevan nekiriye. Ev mafekî sereke ye û bingeha derbirîna nêrînan û

beşdarîya civakî û siyasî ye. Behsnekirina vî mafî di vê danezanê de, di warê pabendîya bi pîvanên mafên şarwer û siyasî yên ku li ser asta navdewletî nasandî ne, kêmasîyeke mezin e.

## Pêncem: Dawî

Em dizanin ku qonaxên veguhêzer ên paş xistina pergaleke zordest bi rêya hêza leşkerî û piştî şerekî xwîndar ê demdirêj, ji ber sedemên objektîv, dûrî pîvanên demokratîk in. Nemaze di rewşeke wekî rewşa Sûrîyayê de ku di vê dema han de pêkanîna hilbijartinên demokratîk ên rastîn meseleyeke pir aloz û zehmet e; lê dîsa jî alîyê ku ev danezana makeqanûnî danîye karîbû xwe dûrî gelek kêmasî û xerabîyên wê bike.

Her wiha tirs heye ku ev danezan ne tenê rê bide desthilatîya heyî ku karûbarên dewletê di pênc salên hatî de bi rê ve bibe; dibe ku ev danezan bibe alaveke jinûvesazkirina sazîyên dewletê û pêkanîna wan li gor vîn û nêrîneke yekalî ku birêveberîya heyî li gorê dimeşe û guh nade tu pêvajoyeke demokratîk a hevpar û rastîn. Belavkirina gotareke nezelal, eşkerenekirina sazgêrîyên dîyar, pîvanên bellî, dem û cîyên destnîşankirî û desthilatîyên baldar, metirsîya dubarekirin û berdewamkirina şêwaza pergala zordest a berê derdixe holê; ew pergala ku xelkê Sûrîyayê şêst salî di nav herîya wê de niqumîbû.

Bi her halî, piştî ku serokkomar danezana makeqanûnî pesend kir, hîn derfet heye ku gavek ber bi pêş ve bê avêtin. Ew gav çi ye? Gerek hin madeyên danezanê bên serrastkirin û hinên din bên zêdekirin, ev yek jî bi rêya pêşniyaza serokkomar û erêkirina encumena gel pêk tê. Tam wekî ku danezanê bi xwe dîyar kiriye. Dibe ku ev derfet hin kêmasîyan tijî bike, çewtîyan serrast bike û rê li pêş avakirina qonaxeke veguhêzer a hevsengtir û rewatir veke û pê re pergaleke siyasî ya li ser bingeha serwerîya qanûnê û mafên mirovan bê damzrandin.